


# DI TÊKOŞÎNA LI DIJÎ ÎSTÎSMARA ZAYENDÎ DE BERPIRSIYARIYÊN DIKEVIN SER MILÊN MEZINAN

û

## "MAFÊN ZAROKAN ÊN GOTINÊ YÊN DERBARÊ LAŞÊN WAN DE"

Association for Struggle against Sexual Violence

Ev broşur ji aliyê Komeleya Têkoşîna Li Dijî Tundkariya Zayêndî ve, bi piştgiriya darayî ya Swêdê hatiye çapkirin.

Sweden
Sverige

Association for Struggle against Sexual Violence

info@cinselsiddetlemucadele.org

www.cinselsiddetlemucadele.org

**Amadekar**
Nurgül Öz, Psîkolog
Ceren Suntekin, Pispora Xizmetguzariya Civakî

**Dîzayn**



**Illustrasyon**
Ceren Suntekin

**Werger**
Ferid Demirel


**Sibat 2022**

# NAVEROK


08 Mirov dikare pêşî li îstîsmara zayendî bigire


12 Îstîsmara zayendî: Çi ye û çend cûreyên wê hene?


18 Şaşiyên derbarê îstîsmara zayendî de


26 Guhertin wê bi me destpê bike


30 Mafên zarokan ên gotinê yên derbarê laşên wan de


36 Lîsteya kontrolkirinê ya mezinên ku mafên zarokan ên derbarê laşê wan de qebûl dikin


40
Nîyetpakî têrê nake




42
Ji bo têkoşîna bibandor çend şane



46
Piştî behskirina îstîsmarê têkiliya bi zarokan re




50
Agahdarkirin û serlêdan



54
Pêşniyara çavkaniyan



58
Ferhenga têgehan



Ev rêber li gorî Bernameya Belavkirina "Mafên Zarokan ên Gotinê yên Derbarê Laşên Wan de" hatiye amadekirin. Bi amadekirina vê rêberê re em dixwazin bizanibin bê ka mezin bi çi nêrînê li zarokan û laşên zarokan dinêrin, îstîsmara zayendî bi çi rengî dinirxînin û divê ji bo têkoşîna li dijî îstîsmara zayendî çi bikin. Her weha em dixwazin tevahiya van mijaran bi rêk û pêk bicivînin li ser hev.

Hin têgeh û penasekirina van têgehan, dibe ku bûyereke îstîsmara cinsî ya beriya niha hatiye serê te û/an jî tu bûyî şahidê wê, ya ku hê jî bandorê li te dike, bêyî ku te hay jê hebe yan nebe, bîne bîra te; metirsiyên te zêde bike, bibe sedema zindîkirina tecrûbeya tundkariyê. Ji ber wê ye ku beriya tu dest bi xwendinê bikî, em van tiştan pêşniyarî te dikin; xwe amade bike, ger tu pê hisiya ku dê careke din wê bûyerê bîne bîra te navberê bide xwendinê û dema tu amade bî ji bo xwendinê, ger pêwîstiya te hebe bila keseke/î baweriya te pê heye li bal te be û bi vî rengî dewam bike.


EM DIKARIN PÊŞÎ LI ÎSTÎSMARA ZAYENDÎ BIGIRIN!

# mirov dikare pêşî li îstîsmara zayendî bigire

Di serî de divê mirov baweriyê pê bîne ku dikare pêşî li îstîsmara zayendî bigire.

Bergiriya li îstîsmarê hewceyî bi sîstemeke berfireh heye. Devlet ji avakirin, çavdêrîkirin, kontrolkirin, nirxandin û bipêşxistina vê sîstemê beriprsiyar e.

Dewlet û rêveberiyên herêmî beriya îstîsmara zayendî pêk were, dikarin gelek **tedbîran** bistînin û gelek gavan biavêjin. Di pêvajoyên pêşxistina plansazî û polîtîkayên stratejîk de, saziyên dewletê û rêveberiyên herêmî dikarin ji saziyên civaka sivîl û pisporên di vî warî de kar dikin, piştgiriyê bixwazin.

Em ango kesên xama dikarin daxwaza sazkirina sîstemên piştgiriyê û pêşîlêgirtinê bikin. Em her yek perçeyek ji civakê ne û her yek ji me, di têkoşîna li dijî îstîsmara zayendî de, em dikarin gelek berpirsiyariyan hilgirin ser milên xwe.

Di mijara pêşîlêgirtina îstîsmara zayendî de, ne ku zarokan fêrî xweparastinê bikin, jê wêdetir, divê em ji mezinan re bibêjin ku îstîsmarê li zarokan nekin. Mezin berpirsiyar in li dijî îstîsmara zayendî têbikoşin, ne zarok.

Di pêvajoya parastina zarokan a îstîsmara zayendî de, tekane rê ne ew e ku zarokan fêrî gotina "Na"yê bikin. Zarok ji xwe dizanin bibêjin "na" û gelek caran dibêjin "na". Ya girîng ew e ku mezin van "na"yan bibihîzin û wan qebûl bikin.
Li gel vê, **dibe ku zarok di dema îstîsmarê de nebêjin "na", lê ev dîsa jî îstîsmar e û berpirsiyariya wê li ser milên mezinan e. Lewre rol û berpirsiyariya bingehîn a mezinan e**. Erka mezinan e ku haya wan ji mafên zarokan ên li ser laşên wan hebe, rêzê ji wan mafan re bigirin û ji bo **çanda pejirandinê*** bicih bibe kar bikin.

*Di dawiya vê rêberê de ferhengek heye. Berfirehiya wateya têgehên bi stêrkê hatine nîşankirin, di wê ferhenga têgehan de ye.



# istîsmara zayendî: çi ye û çend cûreyên wê hene?

## ÎSTÎSMARA ZAYENDÎ:

Îstîsmara zayendî; peymanên navnetewî û metnên hiqûqa netewî, heta 18 saliya wan, her kesî weke zarok qebûl dikin. Dema kesên temenmezin û bikaribin berpirsiyariya xwe bi xwe hilgirin, ên baweriya zarokan bi wan tê, yan jî têkiliyeke wan a otorîter/hiyerarşîk bi zarokan re heye, zarokan ji hêla zayendî ve îstîsmar bikin, em ji vê re dibêjin **îstîsmara zayendî.**

**Cidahiyek di navbera îstîsmara zayendî û lîstikên zayendî yên ji ber meraqkirinê tên lîstin û liv û tevgerên pejirandî yên di navbera hemsalan de çêdibin, heye. Ne heman tişt in.**

Dema kesê îstîsmarê dike ne mezinek, zarokek be, divê neyê ji bîrkirin ku ew kes jî zarokek e û temenê wî di bin 18an dee ye, dibe îstîsmar li wî jî hatibe kirin an jî hîna lê tê kirin û divê ji bo başiya wan derûnnasek piştgiriyê bide herduyan.

## CÛREYÊN ÎSTÎSMARA ZAYENDÎ

Îstîsmara zayendî ne tenê dema dest bidin laş an jî lebatên zayendî yên zarokî pêk tê. Ger em penaseya têgehê bi vî awayî qebûl bikin û em bibêjin, ger dest nedabe laşî ti pirsgirêk nîne, wê gavê em ê nikaribin cûreyên din ên îstîsmara zayendî bibînin. Ne tenê dema dest bidin lebatên zayendî yên zarokan, îstîsmara zayendî pêk tê. Dema destdana tevahiya laşî, lê binêrin, li ser biaxivin, şêweyên axavtin û hezkirinê, hemû jî cûreyên îstîsmara zayendî ne. Loma divê em bizanibin ku her yek ji van cûreyên îstîsmara zayendî jî bandoreke neyînî li derûniya zarokan dikin. Îstîsmara zayendî dibe ku bi rêyên sanal û dijîtal jî pêk were.

Weke di mijarên din ên binpêkirinên mafên zarokan de, divê di mijara îstîsmara zayendî de jî ji bo tenduristiya zarokan û parastina wan, li ***berjewendiya bilind a zarokan** baldar bin. Beriya ku giliyê bûyera îstîsmarê bê kirin, di dema gilîkirinê de û piştî wê, divê li gorî vê rêgezê tevbigerin da ku zarokan ji hemû xetereyan dûr bixin.

**Cûreyên îstîsmara zayendî yên bi temaskirinê pêk tên:**

- Destdana cihekî ji laş û/an jî genîtalên zarokan
- Bihêle ku zarok dest bide laş û/an jî genîtalên xwe
- Ji bo kêfxweşiyê zarokê/î hembêz bike, maç bike, miz bide, xwe tê bide
- Temasa dev û genîtalan (tecawiza oral)
- Tecawiz, hewldana tecawizkirinê
- Seqetkirina genîtal (sinetkirina zarokan a çandî)
- Emeliyatên lêbarkirina zayendê ya ji bo pitikên înterseks
- Îstîsmara zarokan a bi rêya zewacê (Bi darê zorê yan jî bi pejirandinê dike ku zarok di temenê biçûk de bizewice)

**Cûreyên îstîsmara zayendî yên temas tê de nîne:**

- Florta bi zarokekê/î re
- Ger bi rêya înternetê ew û zarokekê/î hev nas bikin, têkiliyê bi zarokekê/î re çêbike, jê re binivîse, fotografan jê bixwaze
- Ger henekên zayendî bi zarokê/î re bike û gotinên zayendî jê re bibêje (rû bi rû an jî dijîtal)
- Ger zayend, laş, lebatên zayendî yên zarokê/î bike mijara tinazan û pesindayîn an jî şermezariyê
- Ger li laş û/an jî lebatên zayendî yên zarokê/î binêre
- Ger li zarokê/î temaşe bike, raçav bike (rasterast an jî bi rengekî dijîtal û bi kamerayê)
- Ger ji bo kêfxewş bibe fotografên zarokê/î bigire yan jî dîmenên wê/î tomar bike, wan veşêre û/an jî li hin deran biweşîne
- Ger ji zarokê/î bixwaze dest bide laşê xwe û/an jî lebatên xwe yên zayendî û lê temaşe bike
- Ger laşê xwe û/an jî lebatên xwe yên zayendî nîşanî zarokî/ê bide
- Ger dest bide xwe û bihêle ku zarok li vî tiştî temaşe bike
- Ger fotograf an jî vîdeoyan nîşanî zarokê/î bide ku tê de tiştên zayendî hebin an jî fîlmên bi vî rengî pê bide temaşekirin
- Ger bihêle ku zarok bibe şahidê têkiliyeke zayendî
- Îstîsmara zayendî ya ji bo bazirganiyê ya zarokê/î (di reklaman de bide lîstin, îstîsmara zayendî ya sanal hwd.)
- Ger zarokî/ê di çêkirina kel û pelên pornografîk de bikar bîne; temaşekirina li van, bi zanebûn veşêre, belav bike
- Gotin û liv û tevgerên cidakarî, yên zext û zordariyê û tundkariyê yên li dijî îfadekirina zayendî ya zarokê/î û yên li dijî nasnameya zayendî, meyla zayendî ya zarokê/î.

Îstîsmara zayendî cûreyeke ji tundkariya zayendî ye. Îstîsmara zayendi jî weke hemû liv û tevgerên tundkariyê ne ji ber zayendîtiyê ye lê ji ber hêz û hiyerarşiyê pêk tê. Kesê ku îstîsmara zayendî li zarokan dike, dizanin laş, hiş, bîrbirî û tecrûbeyên zarokan lawaz in û vê jî ji bo niyeta xwe ya xirab bikar tîne û bi vî tundkariyê dike. Li gorî bîr û baweriyê, lawaziya zarokan ji ber cidahiyên fîzîkî ye, na ev ne rast e, ji vê zêdetir e,. Zarok ji ber nêrîna civakî ye ku cûdahiyan li zarokan bar dikin, ew cidahiyên hisî û bîrbiriyê ne. **Li civakên ku zarokan weke kesên xwedî-şexsiyet nabînin, mafên zarokan nadin wan, nikaribin perwerdeya zayendîtiyê ya berfireh bidest bixin, nahêlin zarok biaxivin, kesên xama otorîteyeke berfireh li ser zarokan çêdikin**, mezin bi rêjeyeke zêdetir zarokan îstîsmar dikin.


JIRÊDERKETÎ, PEDOFÎLÎ,
NEXWEŞ
MIROVKUJ, CINAWIR
FAÎL, TU, EZ, EW...

# şaşiyên derbarê îstîsmara zayendî de

Di her civakê de baweriyên şaş ên derbarê îstîsmara zayendî de hene ku belav bûne. Ev bawerî hev xurt dikin û astengiyan li ber têkoşîna bibandor a îstîsmara zayendî derdixin. Ji bo di mijara îstîsmara zayendî de bêdengiya di nava civakê de bikaribe bişkîne, divê mirov di serî de xwediyê zanyarî û helwesteke rast be. Divê mezin; baş bizanibin bê ka naveroka îstîsmara zayendî çi ye, sedem û bandorên wê çi ne û zanyariyên rast û yên zanistî kîjan in û di bergiriya îstîsmarê de divê berpirsiyariyê hildin ser milên xwe.

Hûnê di vê lîsteyê de baweriyên şaş ên berbelav ên derbarê cûreyên îstîsmara zayendî yên li zarokan tên kirin -bi taybet ên ku temas tê de hene- bixwînin û sedema ku çima şaş in, bibînin. Dema behsa îstîsmara zayendî dibe, piranî cûreyên ku temas tê de hene, tên bîra mirovan. Ji ber wê jî mîtos bêhtir bi van cûreyên îstîsmarê re têkildar in. Lê divê em ji bîr nekin ku îstîsmara zayendî ne tenê bi rêya destdanê pêk tê.

**"Îstîsmara zayendî li der û dora min pêk nayê."**

Di bingeha hemû baweriyên şaş de ev hizir heye. Em dixwazin bawer bikin ku îstîsmar li der û dora me pêk nayê; lê ya rast ew e ku îstîsmar li der û roda me jî pêk tê. Bêyî ku li rewşa sosyo-ekonomîk, etnîsîte, xwende/nexwende, pîşe, statu, temen û cihê niştecihbûnê binêre, îstîsmar **di nava her tebeqeyên civakî de** pêk tê. Dibe tu ji xwe re bibêjî, ez bawer dikim ku rastî zarokekî/e îstîsmara zayendî lê bûye nehatime. Lê her çend te ferq nekiribe jî, ihtimaleke mezin e ku ji rêjeya tu hêvî dikî bêhtir, tu rastî îstîsmara zayendî hatibe.

**“Îstîsmara zayendî; li park, kolanên xalî yan jî li cihên wisa pêk tên û piranî mêrên kal, kesên xerîb û yên derbeder îstîsmarê dikin.”**

Ne biqasî demên berê be jî niha jî ew baweriya ku dibêjin “xerîbên bawerî bi wan nayin zarokan bi şekir û çîqoletayan dixapînin” di nava civakê de heye. Berovajî baweriya di nava civakê de, îstîsmar tenê li park, kolanên xalî ango li cihên ne-ewle pêk naye û kesên îstîsmarê dikin piranî ne tenê mêrên kal, xerîb û yên derbeder in. Îstîsmara zayendî li her cihên ku zarok û kesên têkiliya otorîte/hiyerarşiyê di navbera wan de heye; li malan, li dibistanan, li kolanan, li nava serwîsan, li îbadetxaneyan, li parkan, li ser medyaya civakî pêk tê û jin jî îstîsmara zayendî dikin. Lewre dema mirov ji zarokan re dibêje, ‘bi xerîban re xeber nede’, ‘bila baweriya te bi kesên tu wan nas nekî neye’ ji bo bergiriya îstîsmarê ev têrê nake û hemû hêlên mijarê ne ev in. Li gorî îstatîstîkan, kesên ku **zarok wan nas dikin û baweriya wan pê tê**, bêhtir îstîsmarê dikin. Ev kes têkiliyên demdirêj çêdikin û baweriyê didin zarokan û ev îstîsmar bi plan pêk tê.

**“Kesên îstîsmarê dikin, jirêderketî, nexweş an jî pedofîl in.”**

Dewamkirina vê baweriyê di nava civakê de, em ê bihêlin ku bûyerên îstîsmara zayendî ji me dûr bibin. Lê faîlên îstîsmara zayendî di nava jiyana me de, li der û dora me ne, ew kesên ji rêzê ne. Dibe ku faîl em bi xwe bin jî. Her kesê/a ku îstîsmara zayendî kiriye ne pedofîl* e. Her bûyereke îstîsmarê, ne ji ber ku kesê/a îstîsmar kiriye nekarîbû hewesa xwe ya zayendî kontrol bike, nexweş e yan jî ji rê derketiye pêk hatiye. Kesên îstîsmarkar dibe xwediyê hêz, otorîte, statu û îmtiyazê bin; an jî zewicî bin, dê yan bav bin. Yên der û dora wan ji wan hez dikin û hurmetê nîşanî wan didin jî dikarin îstîsmara zayendî bikin. **Tundkariya zayendî ne bi zayendîtiyê ve lê bi hêzê ve têkildar e**.

**“Îstîsmara zayendî her dem bi tundkariya fîzîkî û zorlêkirinê pêk tê.”**

Îstîsmara zayendî her gav bi tirsandina zarokan, gefxwarin, zorlêkirin û bikaranîna hêzê ya li dijî zarokan pêk naye. Di bûyera îstîsmara zayendî de kesên mezin; baweriya zarokan, heyranbûn û hezkirina wan a li beramberî xwe bikar tînin. Di dema îstîsmara zayendî de dibe ku zarok bixwazin ji hêla laş û zayendî ve werin hişyarkirin; bixwazin ew liv û tevger pêk werin. Lê ev rewş bi ti awayî wê rastiyê **naguherîne** ku ew, îstîsmar e. Dibe bi hin tiştan bikin ku zarok îstîsmarê bipejirînin û bifikirin ku ji bilî vê, ti tiştekî din nikarin bikin û ji îstîsmarê re bêdeng bimînin. Weke îstîsmara bi rêya zewacê pêk tê, dibe mezin bikin ku zarok wî tiştî bipejirînin an jî ti rêyek din ji wan re nehêlin û bi vî rengî zarok nikaribin dengê xwe ji liv û tevgera îstîsmarê re nekin, mîna îstîsmara ku bi rêya zewacê pêk tê.

## “Şekl û şemal û liv û tevgerên zarokan dibin sedema îstîsmarê.”

Îstîsmar ne ji ber zayend, şekl û şemala zarokan an jî ji hêla laşî an jî hiş ve kêmendam bin an ne, ne ji ber civakîbûn an jî liv û tevgerên wan pek tê, ji ber hin taybetmendiyên cûda pêk tê. Dibe ku zarokî/ê destûr dabe, xwestibe û bi wî rengî tevgeriyabe yan jî daxwaza lîstikeke ku tê de temasa zayendî hebe kiribe. Ev ji mezinî re nabe mahne ji bo liv û tevgera zayendî bike. Her dem berpirsiyarî ya mezinan e ku sînoran deynin û bibêjin, na. Ji bîr nekin, çi gava mezin liv û tevgerekê bikin û nêzîkî zarokan bibin, di vir de nabe em behsa “pejirandinê” bikin. Yê dibe sedema îstîsmarê her dem **faîl bi xwe ye**.

## “Îsîstîsmar tenê li zarokên keç dibe.”

Hejmara zarokên kur ên îstîsmar li wan dibe, qet ne kêm e. Rol û normên zayendî yên di nava civakê de hatine pejirandin, mêran xurt û qewî qebûl dikin û dibêjin qey îstîsmar li kesên lawaz, ne zêde xurt û hestiyar dibe. Ji ber wê ye, ji civakê heye îstîsmar tenê li zarokên keç dibe. Ev nêrîn jî dike ku, ew bûyerên îstîsmarê **neyin dîtin** ku li zarokên kur û hemû zarokên din ên nakevin nav sînorên zayendî yên civakê dibin.

**"Xama ji zarokan cûdatir in, ya li wan dibe îstîsmar nayê hesibandin."**

Dema mijar dibe kesên xama, di medya û civakê de nêrîna li îstîsmara zayendî diguhere. Di vê demê de laş û zayendî bi lez û beztir diguhere. Li gorî nêrîna civakê, zarok di vê demê de, ne bêguneh in û bi hêsanî tên tawanbarkirin. Lê belê heta 18 saliyê her kes zarok e. Heta 25 saliyê jî mirov hişê mirovan pêş dikeve. Dibe ku kesên xama daxwaza hevşabûnê bikin û hestên xwe yên romantîk ji mezinan re aşkere bikin. Helbet kesên ku divê sînoran deynin mezin in, ev rastî naguhere. Pêdiviya xamayan jî ji sînoran û piştgiriyê heye. Divê em û nêrîna xwe ya xamatiyê rûbarî hev bibin û ji bîr nekin ku hemû liv û tevgerên zayendî yên bi mezinan re têkildar û hiyerarşî tê de hene, îstîsmar in û divê em mafên **hemû zarokan** biparêzin.

**"Xeyalên zarokan pir fireh in, ji ber wê ye li ser îstîsmara zayendî ji ber xwe çîrokan çêdikin."**

Em dibêjin qey ji ber xeyalên zarokan fireh in, ew li ser îstîsmara zayendî ji ber xwe çîrokan çêdikin, pirê caran ev şêwe hizir me rehet dike. Û tew kesê/a ku zarok behsê dike, naseke/î me be û em hêviya vî tiştî wê nekin be... Lê bîra zarokan a gotinan û tecrûbeyên wan ên derbarê zayendîtiyê de têrê nake ku ji ber xwe çîrokan çêbikin. Pirê caran di van mijaran de derewan nakin. Dibe ku derewan dikin, lê li pişt liv û tevgereke nerast, **îhmalkarî yan jî îstîsmareke din** heye û teqez divê lêkolîna wê were kirin. Ger baweriya zarokan bi me neye wê nikaribin behsa van liv û tevgeran bikin, wê rêjeya veşartina îstîsmarê zêde bibe; ev jî wê bibe sedema dewamkirina îhmalkarî yan jî îstîsmarê.

**“Ger giliyê bûyera îstîsmarê bikin wê bandoreke neyînî li ser siberoja zarokî/ê bibe. Du sê bûyerên biçûk ne ewqas girîng in, zarok wê wan tiştan zû ji bîr bikin.”**

Pirî caran em dibêjin qey em giliyê bûyera îstîsmarê bikin, wê bandoreke neyînî li ser siberoja zarokî/ê bike. Em dixwazin bawer bikin ku bûyera pêk hatiye ne ewqas girîng e û wê zarok di nava salan de vê bûyerê bi rehetî ji bîr bikin. Lê her cara ku giliyê bûyera îstîsmarê naye kirin, ew mezinên îstîsmar kirine, wê îstîsmarê li hinek zarokên din jî bikin. Divê em ji bîr nekin, îstîsmar ne xetaya zarokî/ê ye, lê ya îstîsmarkarî ye û mezin ji gilîkirina wê berpirsiyar in. Ji bo bikaribin zarokan biparêzin û zarok bextewer û berhemdar bin, di serî de divê **bêdengî ji holê rabe** û li dijî helwesta civakî ya ku mexdûran tawanbar dikin, têkoşînê bikin. Divê neye jibîrkirin, dema em giliyê bûyera îstîsmarê bikin û di hemû qonaxan de bi nêrîneke zarokparêz tevbigerin, em ê bibin alîkar da ku zarok xurt bibin û piştî îstîsmarê şîfayê bibînin.

**“Em çi bikin jî wê îstîsmara zayendî pêk were. Tiştek ji destê me naye...”**

Dibe em bibêjin qey ji bo îstîsmara zayendî tiştek ji destê me naye, em çi bikin jî em ê nikarîbin wê bisekinînin. Lê em dikarin ji dewletê, dadgehan, civakê alîkariyê bixwazin, piştgiriyê bidin rêxistinên civaka sivîl ên ji bo vê mijarê kar dikin. Divê em saziyên peywendîdar agahdar bikin. Berî her tiştî em gotinên tundkariya zayendî bikar neynin. Ya girîng jî em her gavê bînin bîra xwe ku têkoşîna li dijî tundkariya zayendî **ji me destpê dike**. Bi vî rengî em dikarin îstîsmara zayendî asteng bikin. Bi tenê em nehêlin baweriyên şaş belav bibin û li şûna wê em zanyariyên rast bicih bikin, em dikarin gelek tiştan biguherînin.


GUHERÎN WÊ BI ME DEST PÊ BIKE!

# guherîn wê bi me dest pê bike


Axavtina li ser îstîsmara zayendî zehmet e, tundkariya zayendî jî wiha ye. Lê ger em bi dengê bilind behsa vê meseleyê nekin, em ê hebûna wê qebûl nekin û wê zehmet bibe ku em tedbîran li ber wê bistînin. Ji kesên der û dora xwe re behsa tiştên ku tu hîn bûyî bike. Bike ku bila kesên din ên mezin jî ji bo astengkirina îstîsmara zayendî berpirsiyariyê hilgirin. Ji bîr nekin; zarok bi saya parastin, piştgirî û helwesta rast a pisporan, dikarin piştî îstîsmara zayendî şîfayê bibînin; dibe jiyaneke wan a bextewer û berhemdar çêbibe. Gava pêşiyê ew e ku mirov bêdengiyê bidawî bikin.
Ger mirov li dijî îstîsmara zayendî ya mezin li zarokan dikin bêdeng bimîne, lê berteke bide lîstikên zayendî yên zarokan, ev her du tişt li hev nakin. Tiştekî xwezayî ye ku zarok di pêvajoya pêşketina xwe ya zayendî de, bi hemsalên xwe re 'lîstikên zayendî' bilîzin; di dema van lîstikan de dibe hev maçî bikin, ji ber meraqkirin û keşifkirinê li lebatên hev ên zayendî binêrin, xwe di hev de bidin û hin liv û tevgerên weke van tiştan bikin. Divê em van lîstikan û "îstîsmara zayendî" ji hev cûda bikin.

Temenê zarokî/ê çi dibe bila bibe, di têkiliya wan û mezinan de, kesên divê sînoran deynin, ne zarok lê mezin in. Dema we têkiliyek bi zarokekî/ê re danî, BI TI AWAYÎ zarokan sûcdar nekin. Dema behsa rewşekê kir ku ji ber wê nerihet e, bi baldarî nêzîkî hestên wî/ê bibin. Ji bo bikaribe dewam bike û behsa wê rewşê bike, bi baldarî lê guhdar bikin. Ger zarok bizanibin ku hûn li wan guhdar dikin, hûn wan dadgeh û sûcdar nakin; wê ji we re behsa her tiştî bikin. Bi vî awayî hûn dikarin tedbîran ji bo xetereyan bistînin an jî di wexta wê de midaxeleyeke rast li bûyereke îstîsmarê bikin.

Dema ji bo parastina laşê zarokî/ê peyaman bi uslibekî tirsnak bidin, dibe derbarê laşên wan de hestên neyînî bi zarokan re çêbibin. Evê bandoreke neyînî li ser pêşketina wan a zayendî û nêrîna wan a li laşî bike.

Berovajî vê, ger bi zimanekî erênî û yê ku zarokan xurt dike, peyam were dayîn, wê baweriya zarokan bêhtir bi xwe were û di warê peywendiyê de ew ê jîr û jêhatîtir bibin.

| Şaş | Rast |
| --- | --- |
| "Nehêle ti kes destê xwe bide te." | "Tu yî xwediyê laşê xwe, mafê te heye ku ez jî tê de tu her gavê ji her kesî re bibêje na." |
| "Wê te birevînin, wê zerarê bidine te." | "Nabe mezin ji te bixwazin ku tu hin tiştan veşêrî. Ger tiştekî wiha bibe, ez dixwazim tu werî û ji min re bibêjî" |
| "Mirovên xerab hene." | "Nabe ku mezin li ser laşê te pirsan li te bikin û bêyî destûra te destê xwe bidin te." |
| "Ez naxwazim careke din bibihîzim" | "Tu dikarî her tiştî ji min re bibêjî, hewce nake ku tu tiştekî ji min veşêrî." |
| "Ew derên te cihên xeter in, divê ti kes destê xwe nedê." | "Tu kesekî/e taybet î, hemû beşên laşê te taybet in û hemû jî biqiymet in." |
| "Qedexe, guneh, şerm.." | "Zayendî perçeyek ji pêşketina xwezayî ye, çi tiştên ku tu li ser laşê xwe meraq dikî, tu dikarî ji min bipirsî." |



# mafê zarokan ê gotinê yê derbarê laşên wan de

Mafê zarokan ên gotinê yên derbarê laşên wan de, yek ji encamên mafên beşdariya zarokan e ku ew jî yek ji xalên bingehîn ên peymana mafên zarokan e. Beşdariya zarokan* tê wê wateyê ku zarok di mijarên têkildarî xwe de bikaribin hemû amûr û derfetan bidest bixin û bikaribin gotinên xwe bibêjin. Her weha tê wê wateyê ku mezin guh bidin van gotinan. Mîna mezinan, mafên zarokan ên gotin gotinê yên derbarê laşên wan de hene.

- Beriya her kesî divê tu qebûl bikî ku zarok bi xwe xwediyê laşên xwe ne. Nabe tu bi darê zorê maçî wan bikî, wan tengav bikî û ji wan hez bikî, bi darê zorê maçî te bikin û hin tiştên din. Dibe li gor te ev bêguneh bin lê divê tu li ser wan hûr bibî.

- Temas an jî destdan ne tekane rê û rêbaz e ku mirov pê hezkirin an jî qiymetdayîna xwe ji hin kesan re nîşan bide. Hezkirin û qîymetdayîn; devkî jî dibe û her weha mirov dikare bihêle ku zarok gotinên xwe bibêjin û bi vî rengî hez bikin û qiymetê bidin mirovan. Dema zarok bibêjin "na" lê hûn van "na"yan nebihîzin û israr bikin ku dest bidin laşê wan; wê zarok bibêjin qey mafê wan nîne ew bi xwe kontrola laşên xwe bikin û hûn an jî hin mezinên din kengî bixwazin û bi çi awayî bixwazin wê bikaribin dest bidin laşê wan.

- Ger ji bo zarok we maç bikin an jî we hembêz bikin hûn hin sozan bidin wan, lê dema van tiştan nekin hûn bi wan re nepeyivin, ji wan bixeyidin, berê xwe ji wan biguherînin; bi vî tiştî hûn dixwazin ji wan re bibêjin ku ji bextewariya we bêhtir bexteweriya kesên din girîngtir e. Ev ê bibe sebeb ku pêdivî û daxwazên kesên din di ser yên xwe re bigirin û wê avakirina sînorên wan ên şexsî zehmet bibe. Ev peyam dibe bihêle ku zarok li dijî îstîsmar û liv û tevgerên îstîsmarkirinê yên mezinan, nikaribin xwe biparêzin.

- ‘Dema zarok hîn bibin ku ‘Na’ nebersiv e, ew bi xwe jî dikarin bi hêsanî sînorên hin kesên din binpê bikin. Zarokên ku sînorên wan tên binpêkirin, ixtîmaleke mezin e dema mezin bibin, wê bibin kesên sînoran binpê dikin.

- Girîng e ku zarok bikaribin bi xwe hilbijêrin bê ka wê kê maç bikin û kê hembêz bikin. Bi vî rengî wê bizanibin ku mafê laşê wan di destê wan de ye û divê kesên din jî rêzê ji van biryaran re bigirin. Bi vî awayî wê bizanibin bê ka liv û tevgerên mezinan îstîsmar in an jî bêhurmetî ye yan na. Di encamê de wê bizanibin ku ev ne rast in û wê gotinên xwe hêsantir bibêjin.




# TIŞTEKÎ ASAYÎ YE KU JI HEMBÊZKIRIN Û MAÇKIRINAN RE BIBÊJE NA

Di dema betlaneya cejnê de hûn û xizmên xwe hûnê werin ba hev? Aha ev fersendeke gelekî baş e ku hûn ji zarokan re (û mezinan re!) behsa mafên wan ên gotinê yên derbarê laşen wan de û têgeha pejirandinê bikin!



Bihêlin ku bila zarok bikaribin bi xwe hilbijêrin bê wê kê hembêz bikin-hembêz nekin, kê maç bikin-maç nekin. Paşê rêzê nîşanî vê biryara wan bidin.

"Tu dixwazî filan xaltîka xwe hembêz bikî? Na? Bila be."

Ji bilî hembêzkirin an jî maçkirinê, ji wan re behsa alternatîfên cûda yên silavdayînê bikin.

"Tu dixwazî silavê li bêvan mamê xwe bikî? Tu dixwazî bi destê xwe silavê bidî filan xaltîka xwe?"

Ji xizm û hevalên xwe re bibêje bê ka tu dixwazî çi bikî.

"Em filan kesî/ê hîn dikin ku wê ew bi xwe biryarên bi xwe ji bo laşê xwe bide.
Ji ber ku we jî hurmet nîşanî hilbijartinên wê/î da, em spasiya we dikin."


LÎSTEYA KONTROLÊ

# lîsteya kontrolkirinê ya mezinên ku mafên zarokan ên derbarê laşê wan de qebûl dikin

- ☑ Her cara ku ez midaxele li laşê wî/ê dikim ez destûrê jê dixwazim û wê/wî agahdar dikin
- ☑ Dema dibêjin "Na" ez israr nakim an jî ji ber ku dibêjin na, ez bi wan nadim hiskirin ku ew sûcdar in
- ☑ Temas, gotin, nêrîn, liv û tevgerên kêfa wî/ê jê re nayê, ez dewam nakim
- ☑ Ez li gotinên wî/ê yên ji bo derbarê wî/wê de guhdar dikim
- ☑ Bêyî ku ez destûra wî/ê bistînim, ez fotografên wê/î nagirim û li ser medyaya civakî naweşînim

- ☑ Dema ez diaxivim ez wî/wê ji nedîtî ve nayêm
- ☑ Bêyî destûr û agahiya wî/wê ez ji kesên din re behsa sir û hestên wî/wê yên taybet nakim
- ☑ Bêyî destûr û agahiya wî/wê ez naçim cihên wî/wê yên taybet
- ☑ Ez derfetê ji wî/wê re çêdikim da ku pirsên xwe yên derbarê laşê xwe û zayendiyê de bipirse, ji ber axavtin û pirsên wî/wê yên derbarê van mijaran de ez wî/wê nadim ber şermê. Ger pêşdarazên min hebin ez li wan difikirim û ez bersivên xwe bi zanyariyên zanistî piştrast dikim
- ☑ Ez li beramberî zarokan rastgo me
- ☑ Ger ez bersiva pirsekê nizanibim, li şûna ez bersiveke şaş bidime wî/wê, ez dibêjim, "ez nizanim lê ez ê lêkolînê bikim û ji te re bibêjim"

- ☑ Car caran ew liv û tevgerên ku daxwaz dike, ez dibêjim "na" û sedemên vê jî re vedibêjim
- ☑ Ez hîyerarşiyê di navbera cûreyên tundkariyê de çênakim, ez tundkariyê weke tiştekî asayî nîşan nadim û dema tundkarî dibe, ez yekser midaxeleyê dikim
- ☑ Ez li gorî zayendên zarokan ên hatine barkirî* peyamên cûda nadim, ez têkiliya xwe û wî/wê li ser bingehên wekheviyê çêdikim/ ez xwe di mijara zayenda civakî* de perwerde dikim
- ☑ Ji bo taybetmendiyên pêşketinê yên zarokan bizanibim, ez lêkolînan dikim
- ☑ Ez li berjewendiyeke şexsî/hestiyarî/zayendî nagerim


GELO PÊDIVIYA MIN BI VAN TIŞTAN HEYE, YAN YA ZAROKAN?

# nîyetpakî têrê nake

Ferqeke mezin di navbera dengderxistina li dijî tundkariyê û berpirsiyariya pêşîlêgirtina tundkariyê de heye. Ew berteka ku civak piştî îstîsmarê bi lez û bez dide û piştî demeke kurt namîne; niyetpakî ye lê ne zêde baş e. Berovajî wê, ev tişt şaş e, bigelemşe ye û ya muhûm jî demkî ye.

Gelek ji me, hêrsa xwe bi rengekî derdixin holê lê dema dor tê ji bo guhertina şertan, em gavên berbiçav navêjin. Em serê xwe bi sedemên îstîsmarê, bê ka civak çawa wê ava dike, ferqa qaweta mezin û zarokan re naêşînin.

Gelek caran ji bo em balê bikişînin li ser mijarê û hestên xwe parve bikin, em hin nûçeyan diweşînin û belav dikin ku zanyariyên şaş ên derbarê îstîsmara zayendî de qewîtir dikin û bi wî şêweyî mafên zarokan binpê dikin.

**Divê em bi bertekên ku neçarbûn, sûcdarkirin û înkar tê de nebin, behsa îstîsmara zayendî bikin; divê em helwest û zimanekî wiha saz bikin ku her dem bikarin pê biaxivin.**


EZ JI BO TÊKOŞÎNÊ AMADE ME!
PÊŞÎ EZ Ê ZIMANÊ XWE BIGUHERÎNIM...

# ji bo têkoşîna bibandor çend şane

Li ser îstîsmarê, bi mezinên li der û dora xwe re hin sohbetan bikin, pirsan ji wan bikin, ji bo diyalogek di navbera we de çêbibe û ev diyalog dewam bike, hewl bidin. Peywendiyê bi zêdetir mirovan re deynin, netirsin û li kargehan, di dema civînên xwe yên asayî de, îstîsmara zayendî penase bikin û nav lê bikin. Her gava behsa îstîsmara zayendî were kirin wê ev bihêle ku kesên di nava civakê de xwediyê rolên cidane, gaveke watedar biavêjin.

Çi gava we behsa cezakirina faîlan kir; bi kêmanî du caran behsa piştgiriya kesê/a tundkarî lê hatiye kirin bikin û behsa mafên wî/wê bikin. Ji bîr nekin ku kesên ji tundkariyê filitîne,

tên sûcdarkirin, navê wî/wê dikeve nav lîsteya reş, wan didin ber şermê û têkoşînê li dijî van dikin; û bizanibin ku ew nikarin piştgiriyê bixwazin, daxwaza edaletê bikin, perwerdeya xwe dewam bikin û hin mafên xwe yên din bikar bînin.

Bi gotinên mîna "Jirêderketî, cinawir, pedofîl, kujer" rewşa faîlan neperçivînin. Dibe ku dema hûn van gotinan bibêjin, kela dilê we dakeve, lê ev tişt baweriyên şaş ên derbarê îstîsmara zayendi geştir dikin û dibin sedem ku îstîsmar zêdetir bibe. Ji bîr nekin ku ji her temenî mirov, ji her fikr û ramanê, ji her zayendê, ji her kesên statûya wan civakî-ekonomîk, ji her welatî mirov, dikarin îstîsmara zayendî bikin. Pîşeya failî/ê, welatê faîl lê çêbûye, rewşa penaberiyê ya faîlî/ê, taxa faîl lê dijî diyar nekin û ji ber vê rewşê, hempîşeyên faîlî/ê, welatiyên wî/wê, kesên din ên penaber, bi heman tiştan sûcdar nekin.

Tundkariyê weke nexweşiyeke ku kontrola wê nayê kirin, nîşan nedin.

Bi şîroveyên xwe nekin ku mirov bêhêvî bibin. Tenê peyaman li ser medyaya civakî neweşînin; beşdarî civînên desteya bajarê ku hûn lê dijîn, bibin û ji rêveberiyên xwecihî bixwazin ku bernameyên pêşî li tundkariya zayendî digirin, saz bikin. Bi sazî û rêxistinên civakî yên di vî warî de kar dikin, hevdîtinan bikin, ji bo li taxa we hewldanek destpêbike bibin pêşek.

Fotografên ku zarok tê de ne û nûçeyên ku dikarin travmayê çêbikin, neweşînin. Ji bo peyama we zêdetir were xwendin, zarokan weke amûr pêşkêş nekin.


EZ JI TE BAWER DIKIM...

# piştî behskirina îstîsmarê têkiliya bi zarokan re

- Gotinên zarokî qebûl bike, **jê bawer bike**. Ger tişta ku zarok behs dike, zêde baweriya te pê neyê jî, ji bîr neke ku kêm caran di vê mijarê de tiştên ne rast tên gotin. Ji bo ku ji te re behsa îstîsmarê kir, spasiya wî/wê bike, jê re bibêji ku tu jê hez dikî.

- Hêrs nebe, **aram be, xwînsar be** û hewl bide tu lê guhdar bikî. Dema zarok behsa serpêhatiyên xwe bikin, pê bihisin ku tu bi wan tiştan xemgîn dibî, bi hêsanî dikarin dev jê berdin û behsa îstîsmara lê bûye nekin. Dibe tu bi vî tiştî xwe rehet his bikî lê ji bîr neke, her çend ew nema behsa bûyera îstîsmarê bike jî, ev nayê wê wateyê ku îstîsmar nebûye.

- Ger zarok nexwaze biaxive, bi ser de neçe, zorê lê neke. **Heta ji destê te were**, şîroveyên ku behsa laş û liv û tevgeran dikin, dixwaze penaseyê bike, hûrgiliyan dixwaze, didarizîne, sûcdar dike, ditirsîne, dide şermê, neke û pirsên bi vî rengî neke.

- Zarok pirê caran ji ber liv û tevgerên şaş xwe sûcdar dikin. Jê re bide xuyakirin ku '**mezinê/a ku îstîsmarkar tiştên şaş kiriye, ne tu**'.

- Ya girîng ew e ku dema baweriya zarokan şikest, divê mirov careke din bikin ku zarok jê bawer bikin. Jê re bide xuyakirin ku dema li bal te be ew ê di nava ewlehiyê de be, bike ku ew û mezinê/a îstîsmar lê kiriye rûbirûyî hev bibin, **rêzê ji mehremiyeta wî/wê re nîşan bide** û ji her kesan re behsa tiştên ku hatine serê wî/wê neke.

- Dibe ku zarokê/î destûr dabe, bi xwesteka xwe liv û tevger kiribin an jî daxwaz kiribe ku lîstika temasa zayendî tê de heye bilîze. Lê ev hemû jî nabin mehneya liv û tevgera zayendî ya ku mezinî/ê dewam kiriye. Her demê **mezin berpirsiyarin** ku sînoran deynin û bibêjin na. Ji bîr nekin ku dema mijar dibe zarok û mezin, em nikarin behsa 'razîbûnê' bikin.

¤ Dibe kesekî/e ku zarok jê hez dike, girîngiyê didê yan jî kesekî/e ku tu **wî nas dikî û pê bawer dibî, îstîsmar li zarokî/ê kiribe. Her kî dibe bila bibe; wî/ê neparêze, bertekên ku mahneyan ji liv û tevgerên wî/ê re çêdikin, nede**. Îstîsmara zayendî di nava her şert û mercan de û her wextê sûcê îstîsmarkar bi xwe ye.

¤ Ji zarokî/ê re **bibêje** ku bê wê ji niha û pê de çi bibe. Jê re bibêje ku ji bo kesê/a îstîsmar kiriye, ziyanê nede hin kesên din divê ew were astengkirin; bibêje ku tê van zanyariyan bi sazî û kesên peywendîdar re parve bikî.

¤ Piştî ku zarokî/ê ji te re behsa bûyera îstîsmarê kir an jî tu pê hisiya ku îstîsmar bûye, yekser û teqez **haya saziyên peywendîdar jê çêbike û pêvajoyê bişopîne**. Hewl nede ku tu bi rê û rêbazên xwe mijarê çareser bikî.


www.cokmed.net
www.cimer.gov.tr
183,
155,
....

# agahdarkirin û serlêdan

Dibe ku zarok gilî nekin, serpêhatiyên xwe weke îstîsmar binav nekin; ev naye wê wateyê ku tiştên li dijî wan bûne ne îstîsmara zayendî ne. Hebûna gumana îstîsmara zayendî ji bo agahdarkirinê têrê dike. Ne karê me ye ku em bibêjin liv û tevgerek sûc e yan na û divê em demildest haya saziyên peywendîdar jê çêbikin.

## Navendên Agahdarkirin, Piştirî û Zanyariyan

**ALO 183**

Jimara Piştgiriya Civakî ya Wezareta Malbat, Kar û Xizmetguzariya Civakî

**ALO 150**

CIMER - Navenda Ragihandinê ya Serokomariyê (serlêdana online)

**ALO 155**

Polîs

**ALO 156**

Cenderme

Midûriyeta Bajêr a Malbat, Kar û Xizmetguzariya Civakî ya Stenbolê
0212 511 42 75

Navenda Bergirî û Çavdêriya Tundkariyê ya Kozayê (ŞONIM)
0212 465 21 96

Midûriyetên Beşa Zarokan ên Midûriyetên Emniyetê
Nêzîktirîn navendên polîsan
Nêzîktirîn navendên xizmetguzariya civakî
Serdozgeriyên Komarî
Navendên Alîkariya Edlî yên Baroyan
Navendên Mafên Zarokan ên Baroyan
Navendên Çavdêriya li Zarokan (ÇÎM)
Saziya Kontrola Dewletê (KDK): https://kdkcocuk.gov.tr/index.php
Navenda Parastina Zarokan a Zanîngeha Marmarayê
http://macok.marmara.edu.tr/
ÇOKMED (Komeleya Piştgiriya Navendên Parastina Zarokan)
http://cokmed.net/
Nexşeya Parastina Zarokan - http://www.cocukkorumaharitasi.info/
https://sgdd.org.tr/
https://mudem.org/
http://www.mhd.org.tr
http://www.ikgv.org/
https://www.hayatadestek.org/


Sîndirellaya Veje teryan
Pirtûkên Gavkaniyê

# pêşniyara çavkaniyan

Gelek çavkanî hene ku dikarin axaftina we ya bi zarokan re ya derbarê laş, hest, sînor û pêşketina zayendî de hêsan bikin. Sûdê ji çavkaniyên ku ne zayendperest in werbigirin, beşdarî semîner û kargehên peywendîdar bibin.

## Ji bo zarokan

**Kapsamlı Cinsellik Eğitimi Serisi: BEN**
Rayka Kumru, Minty Kitap, 2018

**Hoş Geldim**
Rayka Kumru, Hep Kitap, 2019

**Bu Vücut Benim! Ben Ne Dersem O Olur!**
Jayneen Sanders, Beyaz Balina Yayınları, 2019

**Kız Çocuk Hakları Bildirgesi**
Elisabeth Brami, Yapı Kredi Yayınları, 2017

**Kızlar da Yapar! Erkekler de Yapar!**
Sophie Gourion, Yapı Kredi Yayınları, 2020

**Vejetaryen Külkedisi**
Nunila Lopez, Nota Bene Yayınları, 2012

**Külprensi**
Babette Cole Kuraldışı Yayınları, 2014

**Cinsel Eğitim Öyküleri**
Yaşam Yanardağ Çelik, Net Çocuk Yayınları, 2011

**Teo'nun 'Ben Nereden Geldim?' Kitabı**
Yağmur Artukmaç & İpek Gökozan, Bilgi Yayınevi Çocuk Kitaplığı, 2018

**Çıtır Çıtır Felsefe 4: Oğlanlar ve Kızlar**
Brigitte Labbe ve Michel Puech, Günışığı Kitaplığı, 2016

**Çıtır Çıtır Felsefe 22: Şiddet ve Şiddetsizlik**
Brigitte Labbe ve Michel Puech, Günışığı Kitaplığı, 2016

**Bedenim Bana Ait**
Pro Familia, Gergedan Yayınevi, 2014

**Ben Herkesle Gitmem ki**
Dagmar Geisler, Gergedan Yayınevi, 2017

**Sır Versem Saklar mısın?**
Jennifer Moore Mallinos, Redhouse Kidz Yayınları, 2008

**Kırmızı Çizgi**
Samar Mahfouz Barrraj, Erdem Çocuk, 2017

**Boşluk**
Anna Llenas, Nesin Yayınevi, 2017

**Çok Kötü Bir Şey Oldu: Travma Yaşamış Çocuklar İçin Bir Hikaye**
Okuyan Koala Yayınları, 2016

**Yetişkinler Beni İncitiyor: İstismara Uğramış Çocuklara Yardım**
Marge Eaton Heegaari, İletişim Yayıncılık, 2011

**Pusulacık: Çocuklar İçin İnsan Hakları Eğitimi Kılavuzu**
İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları, 2010

**Kiko ve El**
www.kikoveel.org

**Çocuklar İçin Onay**
https://www.youtube.com/watch?v=E2QZNrTcf9w

**Mino'nun Şarkısı**
https://www.minonunsarkisi.org/

**Pejirndina ji bo Zarokan**
https://www.youtube.com/watch?v=VolU7NMOAwM&list=PL8Ja1aaLvmu-3gVsUi59NJAS4R-h1Ez-2&index=1

## Ji bo mezinan

https://ergengelisimi.org/

https://www.tabukamu.com/

https://www.sekspozitifebeveynlik.com/

https://cinselsiddetlemucadele.org/projeler/cocuk-ve-ergen-odaginda-cinsel-haklar/


ÇI YE?
ÇI YE?
NOT:
WEKHEVÎ
Coffee
time

# ferhenga têgehan

**Çanda pejirandinê:** Di wan hemû têkiliyan de ku li ser hîmên hisî û zayendî çêbûne, pirs li hebûna pejirandinê tê kirin û li ser nîqaş çêdibin û hewl dide ku ev cûre têkilî di nava civakê de belav bibe. Di çanda pejirandinê de; zarok li ser wan hîman tên mezin kirin ku dema dibêjin erê yan jî na, li xwe guhdar dikin û sînorên xwe keşif dikin, li gorî rolên zayenda civakî nayên cidakirin û ji bo hewesa xwe bînin ziman an jî veşêrin, zext û zorî li wan nayê kirin, liv û tevgerên zayendî yên nayên pejirandin nayên teşwîqkirin û bi mehneyên cida û baweriyên şaş tundkariyê hînî kesan nakin.

**Berjewendiyên Bilind ên Zarokan:** Gelek caran di Destûra Bingehîn a Komara Tirkiyeyê û Peymana Mafên Mirovan a NYyê de behsa vê têgehê tê kirin ku Tirkiye yek ji aliyên vê Peymanê ye. Tê wê wateyê ku, ji bo tenduristî, pêşketin û jîyan û ewlehiya zarokan, di her şert û mercan de mafê wekhevî, edalet, aştî, azadî, eleqe, bextewarî, hezkirin û têgihiştinê yê zarokan misoger bike. Yanî, dema saziyên fermî û yên taybet, dadgeh, saziyên îdarî û yên yasadanînê, çi dema xebatên bi zarokan re peywendîdar bikin, divê li gorî berjewendiyên bilind ên zarokan tevbigerin. Erkdarên biryaran didin, yasaçêker, di hemû şert û mercan de divê li gorî vê rêgezê tevbigerin. Her weha divê şert û mercan ji bo zarokan ava bikin ku bikaribin bêyî zext û zor li wan bibin, xwe-îfade bikin, berî her tiştî pêdiviyên wan pêk bînin, wan ji tundkariyê biparêzin û pêvajoya pêşketineke baş ji bo wan saz bikin. Erka sereke ya mezinan e ku di her şert û mercî de zarokan biparêzin.

**Interseks:** "Ji bo wan mirovan tê gotin ku di dema jidayikbûnê (yanî bêyî ti destwerdaneke bijîjkî bibe) de taybetmendiyên zayendî yên bingehîn û yên di rêza duyem de saz kirine. Her weha bi temamî ne li gorî penaseya civakî ye ku ji bo jin û mêran bi pêş xistiye. Berê ji bo mirovên înterseks penase bikin, gotina hermafrodît dihate bikaranîn. Lê ev niha nayê qebûl kirin û ne têgeheke rast e. Yek cûre "laşê înterseks" nîne, civak bi piranî wan "anormal" dibîne lê taybetmendiyên wan ên hevpar zêde nînin û rewşên cûda cûda hene. Taybetmendiyên hevbeş ên kesên înterseks ne biyolojiya wan e lê tecrubeyên wan ên bijîjkirinê ye.

**Mafê Beşdariyê yê Zarokan:** Yek ji çar rêgezên bingehîn e ku di ev rêgez Paymana Mafên Zarokan de ne. Çend mafên beşdariyê yên zarokan ev in, divê cidakarî neyê kirin, piştgiriyê bidin pêşketina wan û di her şert û mercan de berjewendiyên wan ên bilind derxin pêş. Ji bo zarok bên parastin û ewlehiya wan dabîn bibe mafê beşdariyê yê zarokan bibandortirîn rê ye.
Ev maf wê bihêle ku zarok gotinên xwe bi azadî bibêjin, bikaribin hizr û ramanên xwe di hemû mijarên derbarê zarokan de diyar bikin û dema biryar hatin girtin, pêdiviyên xwe di nava wan de bicih bikin. Ne tenê divê ji zarokan bipirsin bê ka fikrên we çi ne. Ev maf bi vê re ne sînorkirî ye. Divê şert û mercên guncav hebin ku fikrên xwe aşkere bikin û mezinên li wan guhdar bikin û mixatabên wan jî hebin. Zarok di mijarên bi wan re peywendîdar de, pispor in. Lewre ji wan baştir kes pêdiviyên wan nizanin û nikarin bi qasî wan analîz bikin. Erka mezinan e ku guh bidin wan, ji wan re derfetan ava bikin û ji bo van pêdiviyan, polîtîka û tiştên pêwîst bikin.

**Pedofîl:** Pedofîlî teşxîseke bijîjkî ye. Dema kesek bi kêmanî 6 mehan gelekî zêde bixwaze bi zarokekê/î yan jî zarokên nexama re bikeve nava liv û tevgera zayendî, ev liv û tevger û hewesa wî/ê ya zayendî û fanteziyên wî/ê yên zayendî gelek caran derkeve holê, ji vê re dibêjin

pedofîlî. Îstîsmara zayendî ya li dijî zarokan ne penaseyeke bijîşkî ye û her kesê/a îstîsmar li zarokan kiriye jî ne pedofîl e.

**Zayenda barkirî (sex):** Kategoriyeke ku di encama pêvajoyeke bijîşkî de hatiye diyarkirin; bi piranî piştî di ultrasonê de yan jî di dema jidayikbûnê de lebatên genîtal xuya dibin, zayenda zarokî tê diyarkirin an jî barkirin. Li hin welatan/çandan ji van sînoran dertê lê bi piranî ev zayend bi du heban sînor kirine ango keç û kur / jin û mêr tenê hene. Piraniya caran têgehên "zayenda biyolojîk" an jî "zayenda laşî" tê bikaranîn lê ji ber ku divê de îradeya wî/wê kesî/ê nîne û tibê ev tişt diyar kiriye, divê têgeha "zayenda barkirî" yan jî "zayenda hatiye diyarkirin" were gotin.

**Zayenda civakî (gender):** Piraniya caran dibêjin qey ew û zayenda barkirî li hev dikin û ji bo normên zayenda civakî û çandî yên bi mêrbûn û jinbûnê re têkildar penase bikin, ev têgeh tê bikaranhin. Di nava têgeha zayenda civakî de nasnameya zayendî, meyla zayendî û zayendîtî jî heye. Nasnameya zayendî kompleks, herikbar û şexsî ye. Ji ber wê ye ku mîna sîstema zayendî ya dumend, têkiliya newekhev û hiyerarşîk a li ser bingeha mêr û jinan ava bûye jî çêkirî ye; divê pirsan derbarê wê de bikin, ev tişt were guhertin, veguhestin. Dema qalib û rolên zayenda civakî dijwar bibin û xwe ji guhertinê re dûr bixin, li dijî kesên ne li gorî van qaliban in, zext û tundkariya zêdetir dibe.

er tu bibêjî hin cîh hene hîn jî ne zelal in, ji kerema xwe ji me re binivîse, da ku em li ferhengê zêde bikin.


DÊ, NIHA DOR HAT KU EM VAN ZANZARIYAN PÊK BÎNIN!

not

Association for
Struggle against
Sexual Violence

cinselsiddetlemucadele cs_mucadele cinselsiddetlemucadeledernegi

www.cinselsiddetlemucadele.org